Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1112 | 29-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# “Cihêliyên Cîhanê” ji bo Kurmancî hat wergerkirin

**Zanîngeha Rojava pirtûka nivîskarê bi nav û deng Frantz Fanon a bi navê “Les Damnés de la Terre (Cihêliyên Cîhanê)” bi zaravayê Kurmancî çap kir.**




Pirtûk ji aliyê Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Rojava ve ji bo zaravayê Kurmancî yê Kurdî hatiye amadekirin. Îbrahîm Seydo Aydogan, Yaqob Tilermenî û Remezan Pertew pirtûk ji zimanê Fransî ji bo Kurmancî werger kiriye.

Pirtûk ji aliyê weşanên Zanîngeha Rojava ve di Tîrmeha 2023`an de, li çapxaneya Beyan a li bajarê Qamişlo hatiye derxistin. Pirtûk li Zanîngeha Kobanê, Zanîngeha Rojava û Zanîngeha El Şerq hatine şandin.


“Cihêliyên cîhanê” ji aliyê nivîskarê nav û deng ê Fransî Frantz Fanon ve di sala 1961`an hatiye amadekirin. Di pirtûkê de bandorên piskolojîk ku mêtingerî li ser gelên mêtingeh avakiriye bi awayeke berfireh tê analîzkirin. Pirtûka ku berhema herî bi nav û deng a nivîskar e, wekî manîfestoya têkoşîna dijî mêtingerî û azadiya cîhana sêyemîn tê zanîn. Bi vî rengî pirtûk bûye çavkaniya tevgerên azadiya netewî yên li Efrîqa û rêxistina `pilingên reşa ya li DYA`yê`.

Ev dibe pirtûka yekemîn ku ji aliyê Enstîtuya Zanistên Civakî ve hatiye wergerkirin û çapkirin. Beşê Enstîtuya Zanistên Civakî li Zanîngeha Rojava di 2020`an de hat vekirin, wekî beşek Zanîngeha Rojava xebatên lêkolîn û wergerên akademîk û zanistî dike.

Li gorî agahiyên ku yek ji berpirsên Enstîtuya Zanistên Civakî Serdar Saedî dane me li ensîtuyê wergera 5 pirtûkên din û 60 gotarên akademîk hatiye kirin.

# Xewna Nagîhanê bû rastî

Beriya şehîd bibe, Nagîhan Akarsel bajar bi bajar û gund bi gund digeriya da ku jinan bibîne û xewna xwe pêk bîne: Berhevkirina ked û berhemên jinan li Pirtûkxaneya Jinan. Wê dixwest li ser berhemên berhevkirî yên jinan lêkolîn çêbibin û bi çav û asoyê Jineolojiyê dîroka nayê zanîn a jinan bê nivîsandin. Lê mixabin wê nekarî, Pirtûkxaneya Jinên Kurd a ku xewna wê bû, bibe serî. Hevrêyên Nagîhanê, ev xewna wê piştî şehîdbûna wê bi cih anîn. Wan tevî astengî û zehmetiyan hemûyan, 24´ê Hezîranê Navenda Pirtûkxane, Arşîv û Lêkolînê ya Jinên Kurd li Silêmaniyê hat vekirin.



Ez li vê pirtûkxaneya ku xewna Nagîhan bû, bûm mêvan. Li pirtûkxaneyê, odeya kitêban, odeya çandê, ya rêveberiyê û Quncika Nagîhan Akarsel hene. Odeyeke din a pirtûkxaneyê heye, lê hîna ew temam nebûye. Nagîhan Akarselê wiha xwestiye ku ev ode bibe odeyeke ji bo zarokan. Yek ji xewnên wê yên herî mezin ew bûye ku li vê odeyê ji zarokan re bi Kurdî çîrokan bixwîne. Ji bo ku ev xewna wê jî biçe serî, xebat li vir dewam dikin.

Li Pirtûkxaneyê bi sedan kitêbên nivîskarên jin û kitêbên li ser jinan hatine nivîsandin hene. Li odeya çandê berhemên keda destê jinan têنberhevkirin. Amûrên çandî yên weke teşî, meşk û yên din jî li odeyê hatine bicihkirin. Wekî din li odeyê ji her hêla Kurdistanê cilûbergên jinan hene da ku çanda qedîm a Kurdistanê nîşan bidin. Li vir herwiha resm û wêneyên jinan jî hene

Nagîhan Akarsel pir dilsozê çanda xwe ya qedîm bû. Ji ber wê jî quncika Nagîhan Akarsel di vê odeyê de hatiye bicihkirin. Cilûbergên gelêrî yên Nagîhanê, pênûs û deftera wê, nivîsa wê ya nivcomayî ya beriya ku şehîd bibe, li vê quncikê ne. Tiştên Nagîhanê li vê quncikê hatine berhevkirin.

# Xelatên Wêjeyê yên Huseyîn Çelebî hatin dayîn

Çalakiya Wêjeyî ya Huseyîn Çelebî ya 30’emîn li Kolnê ku bajarekê Elmanyayê ye, çê bû. Di çalakiyê de xelat hatin dayîn.

Ji sala 1991’ê ve Pêşbaziya Wêjeyî ya Huseyîn Çelebî tê sazkirin. Çalakiya 30’emîn ji aliyê Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK) û Xwendekarên Jin ên Kurdistanê (JXK) ve hat sazkirin.

Bernameya dayîna xelatan 8’ê Cotmehê bi girtina rêzê ji bo bibîranîna şehîdên Kurdistanê û şoreşê dest pê bû.

Mêvanên ji Baskê jî bi kincên xwe yên gelêrî tevlî bûn û helbestek bi zimanê Baskê hate xwendin. Herwiha helbestên ji Ekuador, Katalonya, Hindistan û Rojava hatine şandin, hatin xwendin.

Di bêşên helbest û çîrokan de bi Elmanî, Kurdî û Tirkî, xelat hatin dayîn. Firmêsk, Rêber Serhed û Sûna Alan derketin ser dikê. Koma Romanî xwenîşandaneke folklorîk pêşkêş kir.

Xelat:

**Kateboriya helbesta bi Kurdî**
1. Xemeke Keserkêş: Feraz Roj
2. Ger xwe nekujim: Welat Xerîb
3. Bê te Bûnî: Mucahît Kaya

**Kategoriya çîroka bi Kurdî**
1. Jin Aryen: Veroz
2. Jiyaneke dorpeçkiri: Seyitxan Akyuz
3. Gurên duling: Ayaz Botan

**Kateboriya helbesta bi Tirkî**
1. Boşverin: Anonim
2. Her Bekleyiş: Zuhat Zana
3. Dövüşenlere Alkış: Emre Genç

**Kategoriya çîrokên bi Tirkî**
1. Berfin’nin Hikayesi: Zeynep Nergiz
2. Onu da mı söyledin?: Eylem Kahraman
3. Uzman çavuşlar ve korucular: **Mehmet Baytimur**

Kategoriya helbestên Zazakî
1. Boye Zembule: Şilan
2. Venge Azadi: Arzun
3. Xo vira meke : Dilbirin

**Kategoriya helbestên Elmanî**
1. Ein Gedicht und ein falke: Alina
2. Spinnerinnen : Carina
3. Diaspora: Hêvîdar




Sudoku: Bersiv 23

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 3 | 9 | 8 | 2 | 7 | 1 | 6 | 4 |
| 2 | 7 | 1 | 4 | 3 | 6 | 8 | 9 | 5 |
| 6 | 4 | 8 | 1 | 9 | 5 | 2 | 3 | 7 |
| 4 | 6 | 7 | 5 | 1 | 3 | 9 | 8 | 2 |
| 1 | 8 | 2 | 9 | 7 | 4 | 3 | 5 | 6 |
| 3 | 9 | 5 | 2 | 6 | 8 | 7 | 4 | 1 |
| 7 | 5 | 4 | 3 | 8 | 2 | 6 | 1 | 9 |
| 9 | 2 | 3 | 6 | 5 | 1 | 4 | 7 | 8 |
| 8 | 1 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 2 | 3 |

Sudoku:Pirs 24

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | | | | | 9 | 7 | 6 | |
| 9 | | | | | 4 | | | |
| | 6 | 4 | | 5 | | 3 | 8 | |
| 7 | 5 | 3 | | | | | | |
| | | 9 | | | | 5 | | |
| | | | | | | 4 | 3 | 2 |
| | 7 | 1 | | 6 | | 9 | 2 | |
| | | | 2 | | | | | 5 |
| | 8 | 2 | 3 | | | | | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Lingê xwe zêde diavêje:**
- Derbasî mafê kesên din dibe.

**Li ser rûnişt:**
- Xwar; ji xwe re bi kar anî; dest danî ser; lê xwedî derket; ji xwe re bir; kir malê xwe.
- Bi zorê dest danî ser.

**Masî masiyan dixwin dibin hût:**
- Dema hin bi zordestiya li hina mezin dibin hingê tê gotin.

**Ma te nanê germ xwariye:**
- Dema yek xurtiyê li hina dike, êrîşî wan dike hingê jê re tê gotin.
- Dema kûçik nanê germ dixwin har dibin.

**Mêrik hat ji newalê bû xwediyê malê:**
-Tişta ne ya wî lê xwedî derdikeve; zordestiyê dike; hem neheq e hem xwediyê heq neheq dike.

**Nahêle çavê xwe veke:**
- Pir dide xebitandin; nahêle bêhna xwe veke; nahêle dinyayê nas bike; pêşiya wî digire.
- Zordestiyê lê dike.

**Nikare xwe di postê xwe de bilivîne:**
- Di binê zordestiyeke pir mezin de ye; pir ditirse.

**Nikare bi yê berdayî, diçe yê girêdayî:**
- Yê bikare li ber xwe bide bi ser wî de naçe, bi ser yê belengaz de diçe.

**Per û baskên wî çêbûne:**
- Zordest e; bitir e.

**Pif dike ewran:**
- Pir hişk e; pir zalim e; rehim di dilê wî de nîne.

**Quloçên wî çêbûne:**
- Bitir bûye; har bûye; zordestiyê dike.

**Seriyan ziwa kur dike:**
- Zordest e; rêveberiya wî pir ne xweş e; dilê wî bi ti kesî naşewite.

**Tepeser kir:**
- Zordestî lê kir; neheqî lê kir; bindest kir; xist bin bandora xwe; çavtirsandî kir.

Teyran tevan bi ser teyrekî de zîrç dikir, **wî jî bi ser çêlîkên xwe de zîrç dikir:**
- Her kesî neheqî lê dikir, wî jî neheqî li malbata xwe dikir.

**Tola Îskê ji Mûskê hiltîne:**
- Yê pê kirî tiştekî jê re nabêje belaya xwe li yê din dide.

**Xinzîr bi selewatan naçe:**
- Kesên zordest bi hêvî û lavelavê belaya xwe ji mirov venakin.

**Xoz (xwez/beraz) bi selewatan nasekine:**
- Bi heman wateyê.

Xwedê diya mirov dide ser zergûniyan, **kerê şamê jî berdide serê:**
- Ji bo kesê zordest û hesabê tiştekî neke tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Ayîşa Hiso: Jin hebûn û hêza civakê ye

Endama Meclisa Giştî ya PYD`ê Ayîşa Hiso diyar kir ku bi saya fikir û ramanên Rêber Apo jina kurd gavên pir mezin avêtin û nasnameya xwe isbat kir, herwiha da zanîn ku jinê bi kar û xebatên xwe, wekî tevahiya qadan, di qada doplomasî de jî rola wê sereke bû.**R-2**



# Ramanê Rêber Apo mifteya çareseriyê ye

Ev zêdetirî 25 salin ku dewletên komploger tecrîdeke girankirî li ser Rêber Apo didine meşandin û dixwazin di kesayeta Rêber Apo de vîna gelê Kurd bişkînin.R-4



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1112 | 29-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# XWENDIN RONAHÎ YE

Bi armanca pêşxistina çanda xwendin, lêhûrbûn û parastina çandî û wêjeyî, li hola Zana ya bajarê Qamişlo, Pêşangeha Şehîd Herekol a 7’emîn bi duruşmeya ‘Xwendin Ronahî ye’ ji aliyê Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi hevkariya Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê hate destpêkirin.**R-3**






# ‘Çareseriya pirsgirêkên herêmê, Pirojeya Rêveberiya Xweser e’


Desteya Têkiliyên Derve a Rêveberiya Xweser bi awayekî domdar Şandeyên derve pêşwazî dike û li gelek paytextên cîhanî hevdîtinan pêk tîne. Endama desteyê Gulistan Elî diyar kir ku naveroka hevdîtinên wan danasîna projeya Rêveberiya Xweser, sûcên dagirkeriya Tirk û pirsgirêka çete û malbatên DAIŞ’î ne.**R-5**

# ‘Divê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were’



Rêvebera Yekîtiya Jinên Êzîdî Hediya Şemo anî ser ziman ku dîroka tcrîdê vedigere dema destpêkirina komployê û ji ber ku dewleta Tirk û hêzên desthilat ji felsefya Rêber Apo ditirsin, Rêbertî tê tecrîdkirin. Herwiha Hediya Şemo diyar kir ku çalakiyên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berdewam in.**R-6**

# Wênesazê ku xewna xwe ya zaroktiyê pêk anî



Wênesaz Hukmet Ibrahîm di 50’î saliya temenê xwe de li hunera zaroktiya xwe vedigere. Ew bi şêwazên xwe yên cuda û balkêş di 11 mehan de 150’î tablo saz kirin. Girêdayî vê yekê Hukmet Ibrahîm anî ziman ku wênesazî nasnameya civakê ye û hezkirina min ji vê hunerê re ji qonaxa zaroktiyê ve ye. Lê ji ber derfetên aborî yên kêm ez jê dûr mam.**R-7**



**100 saliya komara qirker**
Hafiz Ahmet Turhalli *R-6*



**Seyd û Nêçîr**
Sîpan Şînda *R-7*

# Ayîşa Hiso: Jin hebûn û hêza civakê ye

Endama Meclisa Giştî ya PYD`ê Ayîşa Hiso diyar kir ku bi saya fikir û ramanên Rêber Apo jina kurd gavên pir mezin avêtin û nasnameya xwe isbat kir, herwiha da zanîn ku jinê bi kar û xebatên xwe, wekî tevahiya qadan, di qada doplomasî de jî rola wê sereke bû.



**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Derabrê kar, xebat û pêşketina jina kurd di qada doplomasî de Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Ayşa Hiso bersiva pirsê rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**1. Jina kurd bi naskirina fikrê Rêber Apo re tevlî gelek kar û xebatan bû û di asta pêşengtiyê de cihê xwe girt, bi taybet jî di warê doplomasî de. Hûn kar û xebata jina kurd di warê doplomasî de çawa dinirxînin?**

Jina kurd bi taybat, ji kevinbûna xwe ve xwedî lêgerîn bû, di dîroka kurdan de herdem navê jinan li pêş bû, lê mixabin ji ber civaka kurd a ku hatî perçiqandin û ji cewhwerê xwe hatî dûrxistin û fetsandina rihê jinê, ew ji rastiya xwe dûr ket. Lê bi naskirina fikir û ramanên Rêber Apo bi taybet di lêgerîna azadiyê a ku Rêber Apo pêşkêş kiriye û rêhevaltiya bi Rêber Apo re, jin xwedî astek û hebûneke pir li pêşbû, li ser vî esasî jin di nav çalakiyên mezin de bû û bi taybet di warê doplomasî û siyasî de pêşeng bû, lê ji aliyê desthilatdaran jin bi zanebûn ji van herdû qadan hat dûrxistin, kar û pêşketina Jinê di aliyê siyasî de nakeve xizmeta hêzên desthilatdar de, di cîhanê de dema ku jin di warê doplomasî de kar dikir bi hişmendiya mêr hereket dikir, lê bi naskirina fikrê azadiyê û cîgirtina di nav Tevgera Azadeiyê de bi taybet jina doplomasî ya ku niha cih girtiye bi fikir û ramanê Rêber Apo xwe kûr kiriye, jin niha di vê qadê de hêza xwe li gor civakbûyînê, têkiliyên rast û danûstandinên baş, li ser vê esasê di qada siyasî de hebûneke jinê li pêş heye, ji ber hêz û cewhera veşartî ya jinê Rêber Apo di têghişta felsefa azadiya jinê de dema ku pêşkêş kiriye û wek piroje li pêşxistiye, ew jina



ku di lêgerîna xwe de gihiştiye heqîqeta ku dikare hemû kar û xebatan bide meşandin, jin di nasnameya xwe ya heyî de dikarîbû pir xebatên li pêş bide meşandin wek; di partiyên siyasî, di qada doplomasî ,di nûnertiya welatan de û dan û standina jinê bi civakê re li ser esasê avakirina doplomasiyeteke rast, hebûna wê pir li pêşe û di têkoşîna xwe de dema ku kêlî kêlî kar û xebatê xwe dide meşandin, ev hemû bi saya fikir û ramanê Rêber Apo ye.

**2. Di kar û xebata doplomasî de jina kurd îro di çi astê de ye û ji bona ku jina kurd hîn bi rengekî bandor cihê xwe di vî warî de bigre çi tê xwestin û astengiyên li pêşiya wê çi ne?**

Dema em behsa komxebatên doplomasî dikin, tiştê ji jinê tê xwestin ku pêşbixîne, naskirina hewîrdor e û li beramberî êrîşên heyî û hedefkiritina jinan, hêzên desthilatdar hertim jinan dike hedefa xwe, ji ber ku serkeftina pirojeya netewa demokratîk, doplomasiya rasat û siyaseta rast bi pêşengtiya jinê ye, tiştê herî girîng û pêwîst dema ku jin di vê qadê de kar bike destpêkê xwenaskirin û danenaskirin e, gava jin bê hêz, îrade û rol be helbet wê civak jî kole bibe. Bi qasî ku jin di asta tekoşîn û lêgerîna xwe de xurt be, li beramberî hişmendiya heyî a ku jinan bi zanebûn dûrî vê qadê dikin, ew li pêşiya vê hişmendiyê xwe isbat dike, di heman demî de cihê ku jin lê hebe li wir azadî, aramî, doplomasiya rast,sîstemeke demokratîk lê hebe, ev hemû engelên pir mezinin li beramberî jinê ne, ji ber karê doplomasî gelek hesase, li ser vî esasî têkoşîneke bê hempa ji jinê tê xwestin.

**3. Bi Şoreşa Rojava re û ji bona ku doz û têkoşîna gelê kurd a mafdar di nava qada navnetewî de were nîqaşkirin û bandoreke ber bi çav ava bike û piştgirtiyê bigre, weke doplomasiya jin heyanî niha di warê kar û xebatên doplomasî de çi gav hatine avêtin û pêwîste ku di dema pêş de çi were kirin?**

Şoreşa Rojava bi Şorşa jinê tê pênasekirin ji ber ku jin berhema bi dehê sala ya tevgera azadiyê ye, li ser vî esasî jin berdêlên pir mezin dan, tekoşîn û berxwedaniyeke mezin kirin e, jina kurd ya ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd di hemû qadan de li ber xwe dide, da ku bikaribe pirsgirêka xwe ya gelê kurd di asta navneteweyî de çareser bike, gavên pir mezin jê re pêwîstin, di dunyayê de civaka ku her tim rastî qirkirin, kuştin û komkujiyên pir mezin hatiye civaka kurd e, lê îro xebatê ku YPJ'ê da ye isbatkirin, xebatên siyasî yê ku jinê daye meşandin û xebatên bi taybet di nava saziyên heyî a Şoreşa Rojava ya ku jinê birêvebiriye, êdî jina kurd di asta danûstandina xwe de dikarîbû yekîtiya jin bi pêşbixîne, li ser esasê civak, rêxistina demokrat û karîbû danûstandinê xwe bi her jina ku daxwaza wan aşîtiyî û çareserekirina pirsgirêka kurd e pêk bîn e, dema ku silogana `Jin Jiyan Azadî` di asta gerdonî de bû siloganeke li ser hemî zimanên aştî xwaz û demokrat, fikir, raman û tekoşîna Rêber Apo belav bûye, heta ku em bikaribin rewşa heyî derbas bikin pêwîste li ser esasê avakirina yekîtiya jin û yekîtiya civaka demokrat li beraberî hovîtî û êrîşên li ser jinê û li ser civakê bikaribin kar û xebateke pir mezin bidin meşandin.

# Serhildana jinan her dem şoreşa civakî pêk anîye

**Xecê Şen**

Her dîroka ku tê jiyîn erênî yan jî neyînî heta dawî bandora xwe di serî de li ser jîyana jinan û hemû civaka mirovahiyê dike. Dîroka ku erênî û demokratîk, pak, spehî, ji bo xweşî û başiya civaka mirovahiyê afirîner be, bêguman di serî de jin û hemû beşên civakê her kes xwe di wê dîrokê de dibîne û li wê dîroka xwe ya kevnar e xwedî derdikeve. Di serî de jin û hemû beşên civakê ji bo xweşiya wê dîrokê, ji bo domandina wê, roj bi roj û sal bi sal îcadên nû yên herî spehî û diafirîne û ji bo jîyaneke wekhev û bedewîn înşa bike têdikoşe. Wê demê her kes bextewerî, şanazî û mînnetdariya xwe ya pêkhatina wê dîroka pîroz tînin ziman û di jîyana xwe de nemir dikin. Wê demê di serî de jin, ciwan û hemû beşên civakê dibin şagirt û şopdarên wê û ew dîrok weku bîra civakî ji nifşekî derbasî nifşeke nû dikin û ew dîrok her tim di jîyan û bîra civakî de didin jîyîn. Lê ku dîrokeke neyînî be, ne salek, ne pênc hezar sal, milyon hezar salan li ser wê dîrokê re derbas jî bibe, şop û xîzên wê dîrokê ku di canê mirovan de birînên kûr dane çêkirin ne derbas dibe û ne jî tên jibîrkirin. Berevajî xeteriyên wê dîroka ku di jinan de û di kesayeta jinan de jî di civaka mirovahiyê şewitandin, çewisandin, şikandin, kolekirin, talankirin, dagirkirin û çanda desthilatdariya mêrsalariyê ya bîrdozî avakiriye, mirov di roja îro de jî dimîne û bi xeteriyên wê dijî. Wê demê mirov ji wê dîrokê şerm dike û lanet li jîyina wê dîroka ku hişmendî û bîrdoziya yekperestî li ser jinan û hemû mirovahiyê daye ferzkirin tîne. Yek ji wan dîrokan jî dîroka ku mirov ji jîyandina wê şerm bike ya hişmendiya desthilandariya mêrsalarî ya bîrdoziya xwedayê yekperst e ku di şaristaniya Sûmeriyan de, şikandin û kolekerina jinan bi pêş xistiye û çanda "musakkatin" ava kiriye. Ji avabûna vê pergala yekperest û şûn de ev bi awayeke pergalî kuştin, qetilkirin, qirkirin, darizandin, cezakirin û tecawîzkirina li ser jinan di her qadên jîyanê de pêk hatiye û ta roja me ya îro jî ev politikaya desthildariya mêrane hebûna xwe didomîne. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di Parêznameya xwe ya bi navê Parastina Gelekî de ev dîrok wiha pênase kiriye û



weku altarnatîf jî bîrdoziya rizgariya azadiya jinan bi pêş xistiye;

" Em dizanin ku 2.500 sal berî zayînê teqebul dike ku bi navê musakkatin (genelev) yekemîn ji aliyê desthilatdariya mêrane ve li paytexta Sûmerî ya Nippurê hatiye avakirin. Li hember vê jî dîsa mêr şerm nakin ku hê jî jinê sûcdar dikin û bi navê namûsê jinê tewmbar dikin û jinê di bin bandora birdoziya xwe ya desthilatdar û hîyerarşî de dihêle. Encama ku em jê derxînin jî ev e; li dijî hişmendiya desthilatdariya mêrane ya bîrdozî sekna herî rasteqîn a jinan e. Li dijî desthiltdariya bîrdoziya mêrane, bîrdoziya azadiya jinê bi pêş xistine".

Bêguman ji pênaseya Rêbertî de jî tê xuyakirin di vir de du cureyên dîrokê yên dîyarde derdikevin holê. Yek dîroka hişmendiya desthilatdarî mêrane ya hîyerarşîk û yekperest, yek jî dîroka bîrdoziya rizgariya azadiyê û taybet jî ya bîrdoziya azadiya jinan e. Ji destpêka dîroka mirovahiyê û ta niha xeta dîroka bîrdozî û azadiya jinan bi ked, xwîn û xwêdanê hatiye avasazkirin. Jinan ji bo pêşxistin û înşakirina bîrdoziya rizgariya azadiya jinê li hemû cîhanê û di her qadên jîyanê de têkoşîneke bêhempa dane û berdêlên pir mezin dane. Bêguman di encama vê têkoşîna bêhempa de serkeftin û destkeftinên pir pîroz jî bi dest xistine. Ev rastiyek e. Jinan bi serhildana xwe di gelek welat û cîvakan de şoreş pêk anîn e. Di vê esasê de bi sedan jinên ku bûne sembola têkoşîna azadiya jinan a şoreşa civakî hene. Anku jinan di her serdemê de sembola xwe ya têkoşîna azadiyê afirandine. Ev carinan bi fikir û ramana filozof Hypatîa pêk hatiye, carinan jî bi "dasa" (tirpan) jina berxwedêr a Nangelî ku ji bo ku baca "memêçiçik ( meme vergisi) ên xwe nede û hemû jinên Hindîstanî bikaribin bi awayekî azad cilan li xwe bikin û bi awayekî azad bijîn, bi jêkirina memikên xwe serhildanê dike û şoreşa jinan a civaka Hindîstanê bi pêş dixe. Carinan jî porên jinên weku Jîna Emînî bûne sedema raperîna civakî ya "Jin Jîyan Azadî", carinan jî pênûsa zêrîn a Nagîhanan bûne sedema pêkhatina şoreşa hişmendî û di civakan de guhertin û veguhertin pêk anîne. Anku di her dem û dewranan de şoreşa civaka mirovahiyê bi têkoşîna azadiya jinan pêk hatiye.



# Wênesazê ku xewna xwe ya zaroktiyê pêk anî

Wênesaz Hukmet Ibrahîm di 50'î saliya temenê xwe de li hunera zaroktiya xwe vedigere. Ew bi şêwazên xwe yên cuda û balkêş di 11 mehan de 150'î tablo saz kirin. Girêdayî vê yekê Hukmet Ibrahîm anî ziman ku wênesazî nasnameya civakê ye û hezkirina min ji vê hunerê re ji qonaxa zaroktiyê ve ye. Lê ji ber derfetên aborî yên kêm ez jê dûr mam.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Hunera wênesaziyê yek ji hunerên girêdayî hest, çav û ramanên kesê wênesaz e. Hin wênesaz ramanên cîhana xwe ya taybet li ser tabloyan xêz dikin û hin wênesaz rastiya hawîrdora xwe û tişta ku çavên dibîne bi şêwazê xwe xêz dikin. Li gor rêgezên wênesaziyê wênesaz kar dike û afrîneriya wî bi riya berhemên wî ve têne diyarkirin. Gelê kurd xwe ji vê hunerê bêpar nehiştiye. Wênesazên kurd jî bi tiliyên destê xwe yên efsûnî û tabloyên xwe yên objektîv û balkêş mohra xwe li hunera wênesaziyê dane. Yek ji van wênesazan jî Hukmet Ibrahîm e.

### Kurtejiyan û xwendina wênesaz Hukmet Ibrahîm



Wênesaz Ibrahîm girêdayî xwendin û jiyana xwe wiha anî ziman:"Ez wênesaz Hukmet Ibrahîm im, di sala 1965 de li gundê Tenûriyê ji dayîk bûme û min xwendina xwe ya seretayî li dibistana Tenûrî temam kir. Herwiha min qonaxa navîn li Qamişlo dewam kir. Piştre jî min xwendina amadeyî ya pîşesaziyê li her li Qamişlo xwend. Di sala 1986'an de jî min bawernameya amadeyî wergirt û ez çûm bajarê Hesekê da ku dest bi xwendina xwe ya li peymangehê bikim. Min di heman salê de dest bi xwendina peymangeha pîşesaziyê kir û di sal 1988'an de jî derçûm. Ez di dema niha de weke karmendekî li Sitasiyona Siwêdiyê ya bajarê Dêrikê, kar dikim. Ez ji sala 1991'ê ve vî karî dikim. Ez tenê bi xwendina xwe ve mijûl bûm heta ku min xwendin bi dawî kir û derbasî karê piratîkî bûm. Ez di dema niha de karê wênesaziyê dikim, herwiha li aliyekî din jî ez helbestan jî dinivîsînim û heta niha min nêzî 300 helbestî nivîsandiye. Ez ji qonaxa xwendinê ya navîn ve helbestan bi zimanê erebî dinivîsînim. "

### Mijarên wêneyên wî xwedî wate ne

Wênesaz Hukmet Ibrahîm di derbarê mijarên tabloyên xwe de wiha got:"Wênesazî ew hunera ku raman, nêrîn û xeyalên wênesaz vedbêje ye. Herwiha hunera wênesaziyê weke nasnameya civakê tê hesibandin. Li gor min wênesazî wisa ye, ez weke wênesaz li Rojavayê Kurdistanê piraniya mijarên tabloyên min li ser gelê kurd e. Min gelek tabloyên xwe li ser mijarên girêdayî civaka xwe çêkirine. Weke xwezaya filoklora kurdî, min wêne ji rengê jiyana kurdan bi şêweyekî hunerî yê cuda saz kirine. Weke çêkirina danûkan, hêrtina ard, jinê, yekîtiya kurdan, dayika kurd, dîlana kurdî û hwd… Herwiha Ehmedê Xanî jî di bala min de bû, lewra min ji destana Mem û Zîn, tabloyeke hunerî çêkir. Li aliyekî din jî min xwezaya Kurdistanê bi çiya, tembûr, deşt, rûbar, çem, zinar û çiyayên wê ve di tabloyekê de saz kirine. Herwiha jî min li ser bingeha metelok û gotinên pêşiyan yên civaka kurdî hin wêne saz kirine. Weke gotina( Giya di bin keviran de namîne), min ji vê gotinê tabloyeke hunerî



ya balkêş çêkir. Ev tablo teşeyê kevirekî vedihewîne û di nav kevir de jî şaxa dara zeytûnê jî heye. Ev tê wateya ku warê zeytûnan ango wê rojekî Efrîn werê zeytûnan were rizgarkirin û vegere ji xwediyên xwe re.

### Di demeke kurt de 150 tabloyên cuda û balkêş afrandin

Hukmet têkildarî berhemdayîna hunerî û tabloyên xwe, wiha axivî:"Sala bûrî bû ku min dest bi karê wênesaziyê kir. Min bi şêwêyê xwe yê cuda di 11 mehan de 150 tablo saz kirin. Ez wêneyên xwe bi qûm, kevir, nihas, qehwe, qirşikan çêdikim. Herwiha jî li ser dep jî bi riya rengê avî û şelemonê tabloyan saz dikim. Ev yek piştî ku min xwe perwerde kir, li cem min çêbû. Min êdî rojane ji seat 6'ê êvarî heta seat 12'ê şevê kar dikir. Min wiha berdewam kir heta ku 150'î tablo hatine amadekirin. Piştre min pêşangehek bi navê Nameya Newrozê di 16'ê Adara îsal de li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo li dar xist. Min piraniya tabloyên xwe li ser xemgînî, şadî, serhidan, azar, destan û filklora kurdan çêkirine. Ji ber ku Cejina Newrozê ji bo me kurdan roja xweşî, xemgînî û serkeftinê ye, min pêşangeha xwe kir nameya Newrozê. Min xwest ku bi riya vê pêşangehê, nameya xwe bighînim civakê, taybet gelê kurd.

### Destekdayîna malbatê, rê li ber afrîneriya wî vekir

Wênesaz Hukmet Ibrahîm di derbarê destekdayîna malbata wî ji bo pêşxistina asta hunera wênesazyê li cem wî wiha destnîşan kir: " Heskirina min ji hunera wênesaziyê ji zaroktiyê ve destpêkir, di dema xwendina min a seretayî û navîn de jî her berdewambû. Wênesazî ji wê demê de bala min dikşand. Lê min xwe di vî warî de perwerde nedikir û min guh nedida vê hunerê. Yek ji sedemên ku ez ewqasî ji wênesaziyê dûr mam, derfeta aborî ya kêm bû. Min di destpêka 2022 de ji nû ve dest bi karê wênesaziyê kir. Ew jî bi saya keça birayê min, Îman Ibrahîm û hevjînê wê bû. Destpêkê wê ev piroje ji min re pêşinyar kir, min got ez dikarim kar bikim, lê derfeta min ya aborî bi min re ne alîkar e. Wê û hevjînê xwe di vî warî de destek dane min, êdî rê li pêşiya xebata min ya hunerî vebû. Min pêlekê karê wênesaziyê kir û niha jî ez ji ber derfeta xwe ya aborî karê wênesaziyê nakim, ji ber buhabûna alavên ku bi riya wê wêneyan xêzdikim. "

# Jîn û jiyana wargeha Mexmûrê

Hunermendên biçûk ên Koma Jînim Jiyanim a Stêra Zêrîn ya Mexmûrê, bi huner û stranên xwe li wargehê balê dikişînin.

Hunermendên biçûk ên koma Jînim Jiyanim a Stêra Zêrîn ya Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) bi huner û stranên xwe ji niha ve balê dikişînin.

Koma muzîkê ya Jînim Jiyanim ji 10 kesan pêk tê û ev bi qasî sê sal in, li Navenda Stêra Zêrîn a Mexmûrê perwerde dibînim.

Bi dehê caran di pîrozbahî û şahiyan de çûne ser dikê û hunera xwe pêşkêş kirine. Gelek caran, ji bo ku tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar bikin û moralê bidin gel, di çalakiya nobetê ya ku ji 20'ê Tîrmehê ve li Wargeha Mexmûrê hatî destpêkirin de, stranan dibêjin.

Piranî stranên vê komê şoreşgerî û potporî ne. Tenê yek armanca vê



komê heye, ew jî xwedî li çand û hunera xwe ya Kurdî derkevin.

Ji ber vê armancê timî xwe perwerde dikin û pêşdixin. Ev kom bi Komînalbûn û bi hev re ev xebat meşandine, timî bala gel kişandiye û bûye sedem ku zarok û ciwanên wargehê hîn zêdetir berê xwe bidin Navenda Stêra Zêrîn.

Kom ji aliyê gelê wargehê ve jî pir tê hezkirin û êdî hemû kes wan nas dike û piştgiriya xwe bi wan re didin nîşandan. Koma Jînim Jiyanim wek navê xwe jîn û jiyana wargehê ye.

Endamên Koma Jînim Jiyanim a Stêra Zêrîn, li ser karên xwe ji ANF'ê re axivîn.

Endamê Koma Jînim Jiyanim Yasîn Apaydin anî ziman ku dema ew stranan dibêjin kêfxweş dibin û got: "Em koma Jînim Jiyanim in. Em bi kêfxweşî stranan dibêjin û gel jî bi van stranên xwe kêfxweş dikin. Em dixwazin Rêberê me bi fîzîkî bê azadkirin. Stranên ku em dibêjin, em diyarî Rêberê gelê kurd Ebdulah Ocelan û gerîlayên serê çiya dikin."

Viyan Yîgît jî got, "Em wek kom, ev sê salin bi hev re perwerde dibînin û stranan dibêjin. Em li vir xwe fêrî hunera Kurdî dikin."

Dezdar Utun jî got, "Em stranan li ser Rêber gelê kurd Ebdulah Ocelan, şehîd, gerîla û Kurdistanê dibêjin. Di her straneke me de mijarek heye."

Nalîn Apaydin jî wiha hestên xwe bi me re parvekirin û got: "Koma me navê wê Jînim Jiyanim e. Wateya wê pir xweşe, hem jine û hem jîyane. Em wek kom bi stranên xwe gel kêfxweş dikin. Li cihê çalakiyan em stran û hunera xwe pêşkêş dikin. Em bi stranên xwe êrişên li ser Kurdan şermezar dikin û bang li tevahî ciwanan dikin da ku xwedî li çand û hunera Kurdî derbikevin."



## Seyd û Nêçîr

**Sîpan Şînda**

Nêçîrvanî yek ji çanda mirovahiyê ya herî kevin e. Ji berê û pê de mirovan xwe elimandine nêçîrvaniyê û nêçîr demekî dirêj bûye jêderka debara mirovahiyê. Hetanî îro jî di gelek civakan de mirov vê kevneşopiyê dibîne.

Peyva seyd û nêçîrê di zimanê Kurdî de yek wateyê didine. Li piraniya Kurdistanê peyva nêçîrê tê bikaranîn lê belê peyva seydê jî li herêmên weke Botan û Behdînan têtê bikaranîn. Ji ber wê bila çi şêlûbûn nekeve di serê we de. Îro çûna nêçîrê û bûyîn nêçîrvan ne tişteke ji rêzê ye. Her çend civakên seretayî demeke dirêj debara xwe bi nêçîrvaniyê kiribin jî, îro şert û mercên mirovahiyê gelekî hatine guhertin û wateya nêçîr û nêçîrvaniyê jî hatiye guhertin. Di serî de nêçîrvanî girr e. Kesê ku ew girrê nêçîrê kete di zikê wî de, êdî nikare zû bi zû dev jê berde. Ya duduyan jî, hemû kes dikare biçe nêçîrê, lê hemû kes nikare bibe nêçîrvan. Ji ber ku ew hunereke. Ji beriya her tiştî, divê nêçîrvan bizanibe ka wê di kîjan rojê de, di kîjan seetê de biçe nêçîrê. Ya din jî, divê nêçîrvan bizanibe wê biçe kûderê nêçîrê. Bi teybetî nêçîrvaniya pezê kûvî, ya kew û hwd li her derê nabe. Heke tu di demê xwe de neçî nêçîra pezkûviyan, tu nikarî nêçîrê bikî. Mînak, xweş tê bîra min, dema ez zarok bûm bavê min diçû nêçîrê. Di zivistanê de dema berfek hindik biketa ew diçû nêçîrê. Ji ber ku wî digot dewsa sewalên kûvî peydakirin hêsanîtir e. Di rojên xedar û berf de zû bi zû nediçû nêçîrê ji ber ku ew xetere bû û li gorî wî mirovî nedikarî çi dewsa peyda bike yan ji sererast bike. Havînê ji serê sibê zû diçû ber kewan. Wî li dora kehniyan kûlik çêdikir û hêj tarî diçû li kûlika xwe de rûdinişt û li hêviya kewan dima heta bêne ser avê. Ya sisîyan, di nêçîrvaniyê de segvanî şert e. Heke tu ne segvan bî tu nikarî çi nêçîrê bikî û tê her tim dest vala li ser malê de bê.

Ji berê û pê de nêçîrvanî di nav civaka Kurd de heye û belave. Ji feqîran bigire heta mîr û begên Kurdan nêçîrvanî kirine. Mînaka herî tê zanîn yek jê Mihemed Begê Mîrê Bota ye. Li gorî tê gotin, Mîr Mihemed Beg gelek ji seyd û nêçîrê hezdikir. Wî her tim çeka xwe dihilgirt, bi heval û hogir û xulamên xwe ve diçû seydê û bi heftî heftî dima li çolê. Dibêjine girê nêçîrvaniyê ketibûye di zikê wî de û dema ew demekî neçûya nêçîrê hedara wî nedihat. Heta dema ew diçe nêçîrê du nêrîyên kûvî yên gelekî berketî ji xwe re nîşan dike û dibêje divê tu kes van herdû nêrîyan nekuje. Navê yekê dike Efin û yê din jî dike Hejale. Dibêjin ev herdû nêrî dihatin li ser şetê Cizîrê av vedixwarin û diçûn, lê tu kesê ji tirsê Mîr Mihemed Begê de nediwêrî wan bikuje. Dibêjin hemû nêçîrvanên herêma Botan jî Efin û Hejale nasdikirin û tu kesê dengê xwe li wan nedikir.

Peyva nêçîrvan peyveke nêr e. Ji ber ku di dîrokê de nêçîrvanî her karê mêran bûye. Û heta niha jî welê didome. Ji ber wê di nav Kurdan de Nêçîr û Nêçîrvan navên mêran in. Bê goman gelek tişt hene ku mirov li ser nêçîrvaniyê bêje. Lê belê dev ji gotinê berdin û heke zewqa nêçîrvaniyê li we jî dabe, qet dilê xwe nehêlin û rojekê ji xwe re herin nêçîrê û wê kulê di dilê xwe de nehêlin.

# ‘Divê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were’

Rêvebera Yekîtiya Jinên Êzîdî Hediya Şemo anî ser ziman ku dîroka tcrîdê vedigere dema destpêkirina komployê û ji ber ku dewleta Tirk û hêzên desthilat ji felsefya Rêber Apo ditirsin, Rêbertî tê tecrîdkirin. Herwiha Hediya Şemo diyar kir ku çalakiyên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berdewam in.

**Navenda nûçeyan**

Di sala 1999’an de, di encama Komployeke Navneteweyî de ku gelek hêzên navneteweyî tê de cih girtin, Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan hat revandin û radestî dewleta Tirk a faşîst hat kirin. Ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha tecrîdeke giran li ser tê ferizkirin. Ji beriya 23 mehan ve û heta niha tu agahî ji Rêber Apo nehatin e girtin. Hêjayî gotinê ye ku têkildarî azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocelan kampaniyeke cîhanî hate destpêkirin. Ev kampaniya cîhanî jî li 74 navendan tê meşandin û bi rengê daxuyanî, konvedan, komcivînan wê ev kampaniye were meşandin. Girêdayî tecrîda ku li ser Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan tê meşandin rêvebera Yekîtiya Jinên Êzîdî Hediya Şemo ji rojnameya me re axivî.

**‘Çalakiyên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berdewam in’**

Hediya Şemo da zanîn ku wê têkoşîna ji bo azadkirina fîzîkî ya Rêber Apo werin berdewamkirin



û wiha got: “ Dema ku em behsa tecrîda ku li ser Rêber Apo ya ku tê meşandin bikin, divê em 9’ê Cotmeha 1998’an bi bîrbixin. Ji ber ku wê demê komplo li ser Rêbertî hate destpêkirin û di 15’ê Sibata 1999’an de bi komployeke navnetewî hate revandin û girtin. Destpêkirina tecrîdê bi destpêkirina komployê re hate destpêkirin.

Ev bûye zêdeyî 2 sal û nîv ku em ti agahiyan li ser rewşa Rêber Apo nagirin. Rêxistinên cîhanî yên ku bi navê mafê mirovan bang dikin, ev bû 25 sal ku çavên xwe ji tecrîdê girtine. Ev rêxistin bêheqiya ku dewleta Tirkiyê di şexsê Rêber Apo de dike, dibînin, lê bê helwest û çavê xwe ji vê yekê digrtin. Ji bo me ev yek cihê şermezarkirnê ye, lewma gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe, gelê Kurd li hemû Kurdistanê û tevahiya cîhanê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dest bi têkoşîneke bêhempa kirine. Em weke jinên azadîxwaz û li ser asta cîhanê em ê, dest bi damezirandina kongir, konfiranis, hevdîtin, meş û daxuyaniyan ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bikin.”

**‘Tirsa hêzên navdewletî ji felsefeya Rêber Apo ye’**

Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzîdî diyar kir ku felsefeya Rêber Abdullah Ocalan nakeve xizmeta hêzên navdewletî û wiha axivî: “ Felsefeya Rêber Apo li ser bingeha azadiya jin û civakê, pêkhatiye û herwiha yekîtiya gelan ji bona xwe bingeh digre. Ev felsefe li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye pêkanîn û hemû pêkhateyên wê baweriya xwe bi vê felsefeyê anîn e. Herwiha pirtûkên parêznameyên Rêber Apo jî bi gelek zimanan li ser asta cîhanê hatine wergerand. Di heman demê de nav û dengê felsefeya Rêber Apo li tevahiya cîhanê belav bû û bala gelek civakan jî kişand. Pêwîste fikrir û ramanê Rêber Apo herwiha pirtûkên wî di dibistan û zanîngehên cîhanê de bibin metiryalên perwerdeyê û bo xwendekar û civakê wane werin dayîn. Ev yek jî nakeve çarçoveya berjewendiyên hêzên desthilatdar ji bona vê yekê li pêşiya belavbûna remanê Rêber Apo digre û astengiyan derdixe. Di serî de dewleta Tirk a faşîst û piştgirên wê yên hêzên navdewletî, îro fikr û felsefeya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan ji wan re bûye tirsa herî mezin. Lewma tecrîdeke giran li ser Rêber Apo ji aliyê dewleta Tirk a faşist û hêzên navdewletî ve tê kirin. Em vê tecrîdê tu carî qebûl nakin û bi tûndî şermezar dikin. Ji ber ku ev tecrîd ne tenê di şexsê Rêbertî de tê kirin, lê li ser tevahiya gelê kurd e. Pêwîste Gelê Kurd û hemû gelên cîhanê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo her tim li ser piya bin û di nava kar û xebatêdebin.

## 100 saliya komara qirker



Hafiz Ahmet Turhalli

29 Cotmehê 1923 an de Komara Tirk bi awayek fermî hatiye damezrandin. Ev sed sale, komara Tirk û hîşmendîya kemalîzmê buye bela serê milletê Kurd, bi taybetî û milletên dîtir bigiştî. Komara qirker, Kurdîstan û Anadolî kirin mezelên milletan, olan û mezheban. Vê komarê bê kuştin, qirkirin, talan kirin û wêran kirinê, karekî baş di dîroka xwede pêşnexist. Sed salên kû vê komarê li pey xwe hişt, ji bo gel û welatê me bi tenê plansaziya tunnekirin û hilweşandinê bu. Welatê me kû weke bihuşt bu, kir qada mirin, hejarî û belengaziyê. Xapandina mirovan binavên curbecur, dekûdolap û komployên hişmendiya kemalîzmê, plan û dafikên danîn, kû milletên ser vê xakê dijîn tenê bibin Tirk. Ji bo wê wezîrê karê Dadê, yê nijadperest û ne mirov, Mahmut Esat Bozkurt weha digot: Ev welat, welatê me Tirkane, kesên ne Tirk, li vî welatî yek mafê wan tenê heye, ew jî xulamtî û koletiye‘.

Li ser vê hişmendiya hov, ev komar hate birêvebirin.

Milletên dîtir qirkirin, zimanê wan çanda wan û hebûna wan a fîzîkî jî, ji holê rakirin.

Sosretên gellekî giran li serê me Kurdan dane meşandin, em kirin neyarê kok, ol, ziman, çand û mirovahiya xwe. Zarokên me kirin neyarê bav û kalên xwe.

Konsulê Emerîkayê yê despêkê yê komara Tirk Joosep, kemalîzmê weha şîrove dike: ,Wergera hevoka Kemalîzmê, bi wateya cîhanî Faşîzme‘! Kemalîzm faşîzmekî, ji faşîzma Hîtler û Mussolînî girantir û bi jehrtire.

Tiştên bi navê ol ku hişmendiya xwe ji senteza Islama Tirk digre, li nava gelê me belav kirin. Hişmendiyek bi vê rengî avakirin, kesê li Kurd û Kurdîstanê xwedî derkeve, wê ji dîn derkeve û bibe kafir. Kesê bibe Misilmanên senteza Îslama Tirk; divê lixwe û koka xwe nifira bike, ji xwezaya xwe dur bikeve, bibe kemalîst û bibe Tirk. Tişta bi navê ol di nava civaka mede hate bicîh kirin, nîjadperestiya Tirk û olekî dijberî ola Îslamê ya rast bû.

Tiştên bi navê zanist di nava civaka mede hate pêşxistin, serê sibehan di dibistanan de bi siruda Tirkan, xwe înkar kirin, jixwe rev û derew lixwe kirin.

Ev komar li ser tunekirina gelê me û gelên vê herêmê dijîn wek Ermen, Aşûr, Çerkez û gelên kevnar yên dîtir hate damezrandin. Pirs ev e? Ev jehra sed salan wê çawa were bê bandor kirin? Bandora vê jehrê li hemû aliyên jiyana me hatiye bi cîh kirin. Buye weke çandekî û ketiye fikir û ramanê me. Gotinekî Kurdan heye dibêjin, hûn xwe bi heft avan bişûn, hûn paqij nabin.

Belê fikr û ramanê kemalîzmê ku bingeha vê komarê, li ser hatiye ava kirin, li hemû qadên vê xakê hatiye bi cîh kirin. Herî zêde xwe bi navê Ol bi cîh kiriye. Ev ola kû sexteye û bingeha xwe ji kemalîzmê girtiye, buye pirsgirêkek giran. Ji bo oldar di serî de karibin xwe ji vê hişmendiyê azad bikin, divê xwe careke din li gor pîvanên Qur’ana pîroz, suneta Pêxember s.X.l. û eqilekî paqij, ji bêjingê re derbas bikin. Lewre ev Misilmanên ku îro bi navê Misilmantiyê, li ser vê xakê dijîn, ji îslama rast dûre û berovajî vê yekê, îslama dijê, îslama Muhemmedî ye.

# Jinên Efrîn û Şehbayê `piştgiriya pêngavê erka tavahî gelên azadîxwaz e`

**Zana Roj/ Şehba**

Di 10 ê Cotmehê de bi durişmeya “Ji Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Cîhanê pêngava piştgiriya azadiya fîzîkî ya Rêber APO û çareserkirina pirsgirêka Kurd, bi tevlîbûna 74 navendên cîhanê hat destpêkirin. Di çarçoveya vê pêngavê de hemû herêmên Rêverberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştgiriya xwe ji raya giştî re ragihandin. Ji ber felsefeya Rêber APO tavahî rê û rêbazên çareserkirina pirsgirêka Kurd û ya Rojhilata Navîn diyar kiriye. Di asta yekemîn de ev pêngav ji bo misoger kirina azadiya fîzîkî ya rêber APO hatiye orgenîze kirin. li ser vê esasê wê dengê azadîxwazan di hemû cîhanê de ji bo Rêber APO bê bilindkirin. Têkildarî vêngava nû jinên Efrîn û Şehbayê yên bi navê Gulê Mihemed û Lemyea Abas ji rojnameya me re axivîn.

**`Têkbirina tecrîdê misoger e`**

Gulê di destpêkê de tecrîda li ser Rêber APO şermezar kir û wiha domand: “Faşîzma Tirkiyê zêdetirî 2 sala ye Rêber APO di tecrîdeke giran re derbas kiriye, di encama vê tecrîdê de ne parêzer ne jî malbata Rêbertî derbasî Îmraliyê dikin. Ev tecrîda ferz kirî ne li gorî rêgez û zagonên girtiyekî siyasî weke Rêbertî ye. Bi vê polîtîkeyê faşîzma Tirkiyê di vê mijarê de bi îsar e. li hember wê tavahî gelên azadîxwaz û gelê Kurd rabûye ser piyan û nerazîbûna xwe nîşan didin. Me jî ev soz daye heyanî azadiya fîzîkî ya Rêber APO misoger nebe, wê rihetî û aramî nebe para me”.

**`Gelên cîhanê piştgiriya Rêber Ocalan dikim`**

Gulê dest nîşan kir ku felsefe û îdeolojiya Rêber APO li tavahî cîhanê belav bûye û cîhan gihiştiya rastiya ji bilî Pirojeya Rêbertî tu çareserî wê ne bi encam bin û wiha got: “Felsefeya azadî û demokrasiya cîhanî ya ku Rêber Ocalan ji 50 salî ve bi riya pirojeya netewa demokratîk pêşkêşî cîhanê kiriye. di vê kêliyê de êdî tavahî gelên azadîxwaz yên Kurd û ecem. Gihîştine heqîqeta ku ji bilî pirojeya Rêbertî wê tu careserî ji bo guhartina pergala heyî ne bi encamgir bin. Ji bo vê yekê di asta cîhanê de pêngava “Ji Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” hat destpêkirin. Ev pêngav dengê xwe li tavahî cîhanê vedaye û cîhan piştgiriya azadiya fîzîkî ya Rêber APO dike. Ji ber vê yekê divê em li hember faşîzma Tirkiyê û hêzên kompiloger têkoşîneke dîrokî bidin meşandin. ji ber ne tenê gelê Kurd hesabxwestinê ji Tirkiyê dike, êdî cîhan li hember faşîzma Tirkiyê derketiye”.



Gulê Muhemed



Lemya Abas

**`Piştgiriya pêngavê erka tavahî gel û pêkhate ya ye`**

Her wiha Lemya ya ku ji pêkhateya Ereb li Şehbayê jiyan dike. Diyar kir ku di vê pêngavê de divê tavahî gel û pêkhate bibin yek enî û li hember faşîzmê têk bikin û wiha got: “Di sedsala 21 emîn de yekemîn heqîqeta desthilatdariyê bi awayekî cewherî derket û rastiya ku dixwazin îradeya jina azad û gelên azadîxwaz bitepsînin. Bi riya fikirên Rêbertî hat derketin. Bi xwendina rastiya Rêber APO û têgihştina heqîqeta ku dixwaze ji me re bide diyar kirin. me fem kir ku hêzên sermeyedar yên gilobal dixwazin cîhaneke li gor xwe format û terbiye bikin. Hêza jinê ya ku hatiye tepisandin bi Rêber APO re careke din hate vejîn kirin. jinên Kurd, Ereb, Turkmen, Çerkes hwd. Bi vê felsefê re cewher û hêza xwe nas kirin. ji ber vê yekê jî bi taybet jin divê piştgiriya herî xurt ji bo vê pêngavê nîşan bidin. Tavahê gel û pêkhate li hember rûxandina faşîzmê û misogerkirina azadiya fîzîkî ya Reêbertî bibin yek enî û tekoşîn bikin”.



# Bi duruşmeya “Xwendin Ronahî ye” Pêşangeha Ş. Herekol a 7’an hate destpêkirin

Pêşangeha Şehîdî Herekol a pirtûkan bi silogana “Xwendin Ronahî ye” û bi amedebûna rewşenbîr, nivîskar, saziyên Rêveberiya Xweser û bi beşdarbûna weşanxaneyên heremî û navnetewî hate destpêkirin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Desteya Çandê a bakur û rojhilatê Sûriyê bi hevkariya Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê ji bo pêşxistina çanda xwendin, lêhûrbûn û parastina çandî û wêjeyî, îro Pêşangeha Şehîd Herekol a 7’emîn bi duruşmeya ‘Xwendin Ronahî ye’ li hola Zana ya bajarê Qamişlo da destpêkirin. Herwiha 140 hezar pirtûk ji 60 weşanxane û saziyên cuda yên derve û Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pêşangehê de hatin pêşandan. Pirtûkên ku di pêşangehê de hatine pêşandan xwedî mijarên cûrbecûr in; weke pirtûkên siyasî, çandî, dîrokî, civakî, leşkerî, olî, felsefeyî û hwd…

Ev pirtûk jî bi zimanên Kurdî (Kurmancî, Soranî û Zazakî), Erebî, Farsî, Tirkî, Îngilîzî û Fransî ne. Herwiha hin pirtûk jî hatine wergerandin.

Deriyê pêşangehê ji bo herkesî vekiriye û ji seat 10’ê sibehê heya 8’ê êvarî berdewam dike û bi vî rengî pirograma pêşangehê heya 31’ê Cotmehê wê bi rê ve biçe.

Berî ku ev pêşangeh were destpêkirin hemû kesên beşdar xuleyek rêzgirtinê li ser giyanê şehîdan rawestiyan. Herwiha endama komîteya Amadekar Ronahî Hesen gotina destpêkê kir û wiha axivî: “ Destpêkê em sipasiya malbata Şehîd Herekol dikin ku di vê pêşangehê de beşdar bûn û herwiha beşdarbûna rewşenbîr, nivîskar û saziyên Rêvberiya Xweser cihê şanaziyê ye. Em weke Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû hêza xwe ji bo berdewamkirina vekirina vê pêşangehê kar dikin. Dema vekirina pêşangehê berî niha hatibû destnîşankirin, lê ji ber êrîşên dewleta Tirk yên 4’ê Cotmehê hat taloqkirin. Em îro bi hemû vîn û îsrara xwe, di vê rewşa zehmet de dest bi pêşangehê dikin. Ev yek jî bi saya şehîdên me yên ku xwîna xwe ji bo parastina me rijandine. Em soz didin şehîdên xwe ku me ê, hertim ji bo pêşxistin û parastina çand û zimanê xwe kar û xebatê bikin. Di heman demê de jî em ê, her tim bibin destek ji hemû nivîskar, rewşenbîr û weşanxabeyên xwe re.

Herweha li ser navê Hevsengiya Wêjeyê Besam Xelo wiha axivî: “Em 7emîn pêşangeha Şehîd Herekol di şexsê Şehîd Herekol de bibîr tînin û li wî û tevahiya Şehîdan, gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê pîroz dikin. Şoreşa Rojava şoreşeke wêjeyî li Rojava afirand, bi pirtûk û berhemên xwe yên wêjeyî bandor li hemû cîhanê kir û bû milkê hemû kesî. Ev pêşketina ku di warê çandî, fikrî û wêjeyî de çêbûye bi saya Rêber Apo ye. Niha ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêngavek li seranserî cîhanê hatiye destpêkirin, em jî weke wêjevan, rewşenbîr û hemû kesên azadîxwaz tevlî vê pêngavê dibin.




Di dawiyê de hemû kesên beşdar serdana weşanxaneyan kirin û berhemên nû wergirtin.

Hêjayî gotinê ye ku ev pêşangeh di sala 2017’an de ji bo bîranîna şehîd Herekol(Huseyîn Çawşî) hate destpêkirin û îsal di asta beşdarbûnê de ev pêşangeh bûye navnetewî. Ku ji Belcîka, Îtaliya, hemû parçeyên Kurdistanê, Mesr, Libnan û hwd… tevlî vê pêşangehê bûne.

# Divê di sedsala duyemîn de dawî li înkara Kurd û Kurdî bê anîn

**Navenda nûçeyan**

**Sazî û komeleyên ziman û wêjeya kurdî têkildarî salvegera 100’emîn a Komara Tirkiyeyê daxuyaniyek hevpar dan û hat destnîşankirin ku divê dawî li polîtîkaya înkar û pişaftina kurdan bê anîn û daxwaza gelê kurd a perwerdehiya bi zimanê zikmakî û fêrbûna zimanê kurdî bê qebûlkirin.**

Sazî û dezgehên ziman û wêjeya kurdî têkildarî salvegera 100’emîn a damezrandina Komara Tirkiyeyê daxuyaniyek nivîskî weşandin.

Daxuyaniya bi sernavê “Komara Tirkiyeyê di 29ê Cotmeha 2023yan de 100 saliya xwe temam dike” wiha ye:

“Di sed salên borî de li gel ku komar bi hevkarî û têkoşîna hevpar a gelê kurd, tirk û gelên din ên ku li vî welatî dijîn hat parastin û avakirin jî, piştî komar hat avakirin hemû maf û azadiyên gelê Kurd tune hatin hesibandin û hatin înkarkirin û tirkîtî li ser gelê Kurd hat ferzkirin. Ev înkara li ser çand û zimanê kurdî hat wê astê ku, ji bo axaftina bi zimanê Kurdî cezayên pereyan li kurdan hatin birîn.

**Înkarkirina Kurdan**

Gelê kurd ji destpêka avabûna Komara Tirkiyeyê heta vê demê bi vê helwest û nezîkatiya bişaftin, înkar û tunehesibandinê re rû bi rû maye û ji destpêkê heta dawiyê li hemberî vê nêzîkatiya nebixêr û neyarane ji bo parastina rûmet û nirxên xwe yên neteweyî, li hemberî helwesta rayedarên dewletê nerazîbûna xwe nîşan daye, têkoşîn meşandiye, li ber xwe daye, çanda xwe ya qedîm û zimanê xwe yê dewlemend parastiye û ev tekoşîn hîn jî berdewam e.

**Daxwaza fermîbûna zimanê Kurdî**

Wekî hemû gel û neteweyan, ji bo gelê kurd jî parastina çand û ziman hêmanê bingehîn û sereke yê têkoşînê ye. Hemû têkoşînên neteweyî bi daxwaza azadiya çand û ziman dest pê dikin û tên meşandin. Daxwaza gelê kurd a ‘Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî û ji pêşdibistanê heta zanîngehê bibe zimanê perwerdeyê’ daxwazeke rewa û însanî ye.

Di hemû peyman û danezanên navneteweyî û gerdûnî de ev maf, wek mafekî bingehîn ji bo hemû gel û neteweyan hatiye qebûlkirin û ev peyman ji bo gelê kurd jî derbasdar in. Bi vê nêzîkatî û feraseta rayedarên dewletê ji destpêka avabûna komara Tirkiyeyê gelê kurd ji hemû maf û azadiyan bêpar hate hiştin.

Parastina çand, ziman û bidestxistina statûya siyasî bi parastin û pêşxistina çand û ziman pêkan e. Ji bo ku ziman were parastin û bi pêş bikeve, divê bibe zimanê perwerdeyê. Loma gelê kurd ji destpêkê heta vê demê di daxwaza;




‘Ji pêşdibistanê heta zanîngehê perwerdehiya bi zimanê dayîkê’ de bi israr e.

**Giringiya perwerdehiya bi Kurdî**

Bi milyonan zarokên kurd dixwazin bi zimanê dayîka xwe perwerde bibin, bi zimanê xwe bixwînin, xewnên xwe bi zimanê xwe bibînin. Ev maf wekî hemû zarokên cihanê mafê zarokên kurd e jî. Ev mafekî rewa, bingehîn, insanî û gerdûnî ye ku ji bo zarokên kurd bi qasî nan, av û hewayê girîng û jiyanî ye. Li gel van daxwazên gelê kurd ên xwezayî, însanî û gerdûnî, rayedarên Dewleta Tirkiyeyê wekî destpêka komarê hîn jî di polîtîkayên bişaftin û înkarê de israr dikin û înkara li ser hemû nirxên gelê Kurd berdewam e.

Ev jî tê wê wateyê ku mîna sed salên borî yên Komara Tirkiyeyê, polîtîkayên înkar û bişaftinê dê di vê sedsalê de jî li ser bi milyonan zarokên kurd berdewam bin û bi darê zorê perwerdehiya bi zimanê tirkî li ser wan were ferzkirin û zarokên kurd dîsa ji mafê perwerdeya bi zimanê kurdî bêpar werin hiştin.

Di sedsala borî de, di serî de zimanê Kurdî, hemû maf û azadiyên gelê Kurd ên welatîbûne tune hatin hesibandin û înkarkirin.

**Hişyariya bo rayedaran**

Di destpêka sedsala duyemîn a komarê de em wek saziyên zimanê kurdî bi bîr dixin û dibêjin: Dê gelê Kurd di sedsala duyemîn a komarê de polîtîka û pratîkên înkarê yên li ser nirxên xwe qebûl neke û bi vê daxuyaniyê daxwaza xwe ya ‘Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê’ bi zimanekî zelal û biryardar ji rayedarên komarê re radigihînin û dibêjin: Ji bo jiyaneke hevpar û wekhev a hemwelatiyên vî welatî, nêzîkatî û feraseteke wekhev a rayedarên dewletê pêwîst e. Ji bo vê jî pêwîst e xala 42yemîn a zagona bingehîn were sererastkirin an jî ji destûra bingehîn were derxistin, dûreparêziya ku ji aliyê rayedarên tirkiyeyê ve li hemberî xalên 17-29 û 30emîn ên Peymana Mafê Zarokan a Neteweyên Yekbûyî hatine danîn werin rakirin.

Ne kêm, ne zêde… Maf û azadiyên ku ji bo gelê tirk tên pêşkêşkirin, ji bo gelê kurd û hemû gelên li tirkiyeyê dijîn jî, bên pêşkêşkirin da ku gelê kurd û gelên din ên ku welatiyên tirkiyeyê ne, wekî welatiyên tirk, mafê perwerdeya bi zimanê dayikê di serî de, ji hemû maf û azadiyên bingehîn sûdê wergirin.

**Saziyên ku daxuyaniyê îmze kirine wiha ne:**

* Enstîtûya Kurdî ya Amedê
* Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê
* Kovara Çand, Ziman, Folklor û Hunerî Destar (Destar)
* Komeleya Wêjekarên Kurd
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Arî (Arî Der)
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Mezopotamyayê (Med Der)
* Komeleya Lêkolînên Kurdî
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Avestayê (Avesta Der)
* Komeleya Lêkolîn Çand, Ziman û Hunerê ya Ankayê (Anka Der)
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Feratê (Ferat Der)
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Birca Belek
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Botanê (Botan Der)
* Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Arsîsayê (Arsîsa Der)

# Ramanê Rêber Apo mifteya çareseriyê ye

**Ev zêdetirî 25 salin ku dewletên komploger tecrîdeke girankirî li ser Rêber Apo didine meşandin û dixwazin di kesayeta Rêber Apo de vîna gelê Kurd bişkînin.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku di bin şert û mercên giran de li Girtîgeha Tîpa F ya Ewlekariya Bilind a Îmraliyê tê girtin û 2 sal zêdetir e ku tu agahî jê nayên girtin, daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku tecrîda dewleta Tirk a li Îmraliyê li dijî qanûnên navneteweyî ye, her tim bê hincet 'cezayên displînê' li Rêberê Gelê Kurd têne birîn, herî dawî jî ev 6 mehên ku hevdîtina bi malbat û parêzeran re jî nehatiye çêkirin.

**'Tecrîda li ser Rêber Apo her ku diçe girantirdibe'**

Ayid Abrahîm diyar kir ku di ser komploya navneteweyî re 25 sal derbas dibe û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di bin tecrîdeke giran deye û wiha got: "Rêber Abdullah Ocalan ev 25 salin ku li girtîgiha Imraliyê berxwedan û têkoşînê li dijî sîstema hegemon dide meşandin. Mafê jiyanê ji Rêbertî hatiye standin û heya niha nahêlin hevdîtin bi Rêber Abdullah Ocalan re were çêkirin, ji ber fikarek wan heye ku fikir û remanê Rêbertî yê ji bona demokrasiyê li cîhanê zêdetir belav bibe. Divê rêxistinên mafê mirovan yên navnetewî û di serî de CPT bi erkên xwe rabin û çavê xwe ji rewşa Rêbertiyê negrin. Rêber Apo ji bo mafên gelê bindest derketiya holê û têkoşînê dide meşandin, lewra rastî êşkence û tecrîdeke girankirî tê. Herweha di bin navê cezayê disiplînê de derfet nayê dayîn ku hevdîtina parêzer û malbata wî pêre were çêkirin.

Ayid wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Rêber Apo fîzîkî dîl girtiye lê fikir û felsefeya wî di nava gelan de dijî" bi vê peyamê axaftina xwe anî: "Bi girankirina tecrîda li ser Rêber Apo tu carî nikarin vîn û berxwedana me bişkînin. Îmralî deriyê aşîtî û azadiyê ye divê bê vekirin û Rêber Apo bê azadkirin. Ji ber Rêbertî kilîta çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn û cîhanê ye û tevahî gelên Rojhilata Navîn azadiya wan bi azadiya Rêber Apo ve girêdayî ye."

**'Ji bo azadiya Rêber Apo parastina civakî esas e'**

Ayid Abrahîm da zanîn ku ji bo azadiyê parastina civakî pêwîst e û wiha behsa pêkanîna azadiya Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan kir: "Gava ku azadiya Rêber Apo misoger bibe wê parastin û azadiya civakê jî pêkwere. Zextên ku gel li ser dewletê daye avakirin hişt ku dewleta tirk biryara darvekirina Rêber Apo vekişîne û bi tekoşîna gelê Kurd û dostên kurdan komplo hate valederxistin. Herweha dema ku Rêber Apo bi komployeke navnetewî hate revandin û girtin gelek kesan canê xwe dan ber agir li hemberî vê biryarê nerazîbûnên xwe nîşandan. Ji ber vê yekê ancax bi tekoşîn û berxwedana gelê kurd azadiya Rêber Apo pêkwere. Banga me ji hemû parêzer û kesayetên welatparêz re ew e, ku bi erkên xwe rabin û bi fikir û felsefeya Rêber Apo wî azad bikin."

Endamê qordînasiyona TEV-DEM'ê Ayid Abrahîn di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku ew ê li dijî komployê her roj li ser lingan bin û wiha got: "Wê fikirê Rêber Apo yê Netewa Demokratîk bibe bersiva tevahî pirsgirêkên modernîteya kapîtalîst ê ku rojane dunyayê talan û wêran dike, ji bo vê jî em tu carî dev ji bilindkirina têkoşînê bernadin heyanî ku azadiya Rêber Apo pêkwere."

**'Ji ber projeya ku pêşkêş kiriye 25 sal in di zindanê de ye'**

Di heman çarçoveyê de endama



**Ayid Abrahîm**



**Yasmîn Meşayix**

Yekîtiya Rewşenbîran a herêma Cizîrê Yasmîn Meşayix di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser têkoşîna ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo rizgarkirina gelan daye meşandin û gefên li ser wî têne meşandin wiha vegot: "Ji destpêka têkoşîna ku Rêber Apo ji bo rizgarkirin û azadkirina gelên bindest ji hêzên desthiladar dide meşandin". Ji bo çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn Rêber Apo her dem di nava hewldan û lêkolînan de ye, lê çareseriya ku nîşan dike li dijî sîstem û siyasetên hêzên hegomanîk e, lewra bi komployeke navneteweyî Rêber Apo ji Sûriyeyê hat derxistin. Xwestin bi vê komployê projeya Rêber Apo vala derxin û ew radestî dewleta tirk a dagirker kirin, li girtîgeha Îmraliyê heya niha tê dîlgirtin û ev bû 25 sal ku li ser wî tecrîdeke girankirî tê meşandin.

**'Azadiya me bi azadiya Rêber Apo ve girêdayî ye'**

Yasemîn wiha dawî da axaftina xwe û got: "Em di bin konê rûmetê de îro amade bûne, ji bo ku bertekên xwe li dijî komploya navnetewî bidin nîşan dan ji cîhanê re û banga azadiya Rêber Apo dikin. Êdî bes e ji tecrîd û komployê re, em azadiya Rêber Apo dixwazin. Xeyala me ew e ku em Rêber Apo di nav xwe de bibînin û bi hevdû re jiyanek azad û rûmet bijîn. Di vê komployê de dewlet tevahî destên xwe dan hevdû û di kesayeta Rêber Apo de li dijî gelê Kurd komplo pêk anîn. Yek ji wan welatan Sûriyê bû ku di 9'ê Cotmehê de bi komployekê navnetewî Rêber Apo ji Sûriyê derxistin, ev jî destpêka komployê bû. Dîlgirtina Rêber Apo tê wateya tirsek ji fikir û felsefeya wî heye. Ji ber ku fikirên wî li dijî siyaseta desthiladariyê ye. Dem dema azadiya fîzîkî ya Rêbertî ye. Dem dema azadiya gelan e. Dema serhildan û raperîna li dijî dewleta Tirk a dagirker û şikandina deriyên girtîgeha Îmraliyê ye."

# Kurd û neyarên Kurdan

**Cîger Dilşad**

pir caran rastî gotineke wiha hatime;"neyarên me ne wekî neyarên tu welatî-dî ne!" Rast e, neyarên Kurdan ji pir hêlan ve naşebihin dagirkerên deverên din, welatên din. Ji gelek hêlan ve dagirkerên kurdistan'ê xwedî taybetiyên cuda û xweser in.

1-welatekî perçekirî;welatên din yekparebûna axa wan heye, ji dervayî 2-3 mînakan bi gelemperî welatên wan nehatî parçekirin. 2-3 mînakên hene jî ew welatî bûne du perçe;wek Vêtinama, Kore û demekê Yemen, ango li ci û deverên din jî dagirkeriya welatan hatiye kirin, lê mîna li Kurdistan'ê 4 dagirkerî tune ye. Ji lewra jî ji bûyî Kurdistan'ê pênaseya"mîtîngeha navnetewî"hatî kirin.

2-Baweriyeke perçe kirî; di civakên din de baweriya gel bi olekê, an jî bi du olan heye,çê dibe(ne bawerî, ol li Kurdistan'ê çar ol û bi piranîya mezheb û tarîqatên xwe hene.(yanê ne bi tenê ji hêla erdingariya ve ji hêla bawerî û baweriya olî ve jî perçeperçe bûye, ango hatiye perçekirin. Di civakên din de ol ji derva li ser wan hatibe feriz kirin jî, piştî demekê wî gelî kariye bi bawerî û motîfên xwe oleke netewî ji xwe re derxîne holê. Li Kurdistan'ê ol li dijî Kurdan wekî çek lê hatiye û hêj jî tê bi kar anîn.

3-Zimanekî perçe kirî; ji hezarê salan ve nebûyîna xwedî rêveberiyeke navendî, xurtbûna êl û eşîrtiyê, asêbûna erdingariya Kurdistan'ê, ji hêla din ve jî her dewleteke dagirker bi ferizkirina zimanê xwe û înkarkirina zimanê Kurdî, bi xwe re pişaftineke ji ber xwe derxistî holê. Herwiha nebûna elêfbeyeke netewî hiştî ku Kurdên perçeyekî ji wêjeya Kurdên perçeyekî din sûdênwêrnegirin. Vê yekê jî bi demê re dûrketina giyanî derxist holê. Rêber APO vê rastiyê wiha şîrove dike;"Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bi hêz a jiyanê. Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketîbûna jiyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêşde bibe, ew tê wê wateya ku asta xwe ya jiyanê jî pêşde dibe. Dîsa çiqas zimanê xwe ji dest dabe û ketibe bin hegemoniya zimanên din, ev jî tê wê weteyê, ewqasî hatiye mêtin, qirkirin û asîmîlekirin."

4-Sîyaseteke perçe kirî; nebûna bîrdoziyeke netewî (di serdema Feodalîzmê de ol wekî îdeolojyeke netewî rist dilîst) û di encama wan her sê xalên jorîn de sîyaseteke netewî derneketiye holê, ango hafîzeyeke netewî nekemiliye, berevajî wê sîyaseteke perçekirî misaletî ser Kurdan hate kirin. Li gel sîyaseta perçekirî, saziya îxanetê jî wekî sîyaseteke bingehîn xistin nava Kurdan ku, Kurd bi tu carî nikaribin sîyaseteke netewî bi pêş bixin.Çimkî wekî ku Rêber APO dibêje;"Civakên bê polîtîka yan jî polîtîkayên wan qelas, yan wê ji derve ji aliyê desthilatdariyekê ve bêne tunekirin û bibin mîtîngehan jî ji hundir ve wê ji aliyê elîteke desthilatdariyê û çîneke mêtînkar ve zordestiyê bibînin û bêne mêtin"


5-Dilînên perçekirî; bê guman di welatekî perçekirî, civakeke perçekirî, siyaseteke perçekirî û ba weriyên perçekirî de negengaz e ku mirovên xwedî dilên û ramanên kamêl derkevin holê! Li warê ku her tişt perçekirî be wê kesayet jî û dilînên ferdên wê civakê jî perçekirî bin! Ji lewra kesê/a Kurd bi giranî bêdena wan li cihekî ye lê raman, dilîn û xeyalên wan yên perçekirî li sed cihên din e! Kesayetên kemilîne dibin xwedî dilîn û ramanên hatine pijandin û kamil! Kamilbûna kesayetê û dilînan jî bi welatparêziyeke xurt gengaz dibe. Kamilbûna kesayeta Rêber APO bi welatparêziya wî ya xurt ve girêdayî ye.Rêber APO vê rastiyê wiha bi lêv dike;"Bi min de aliyê welatparêziyê xort e. Weke ku ez dizanim çawa bi xwezayê re tê jiyîn, bi hêsanî ez wê ji bîra nakim. Ez li mayîna li wan qiracan, dolan û xerbeyan tu caran eciz nedibûm. Lê gundiyên me yên wê demê her dem direviyan. Ji xwe teşeyê reva ji wan axan qet li xweşiya min nediçû. Ji ketina wan a nava jiyaneke hêsan pir aciz dibûm û vê yekê her dem ez didam hizirandin. Ez her dem li ser wandakirina wan mirovan dihiziriyam."

Picrre Clastres dibêje ku;

"Dîroka gelên ku bê dewlet mane, di heman demê de dîroka têkoşîna wan gelan li dijî dewletê ye." Gotineke rast e. Lê ji bo me kurdan kêm e, Tenê di sedsala 19'mîn Û 20'mîn de bi dehan berxwedan hatine pêşxistin; Baban, Rewandoz, Bedirxan Beg, Ubeydullah Nehrî, Mele Selîmê Bedlîsî, Koçgirî, Mahmud Berzencî, Îsmaîl Simko, Şêx Seîd, Seyîd Riza, Mahabad û hwd. Lê dîroka kurdan bi qasî ku dîroka têkoşîna li dijî dewletê ye, ewqas jî dîroka bi xencera xayînan hatiye lewitandin . Dîroka îxanetê ye! Heta ku dîroka îxanetê û bi taybetî îxaneta Mala Barezani'yan baş veçirînin, kurd fêrî zaravayên xwe nebin, zimanekî hevpar ji zaravayên xwe neafirînin û ji çanda li her perçeyekî bi pêşketî haydar nebin, dilîn û mêjîyekî realîst dernexin holê, yekîtiyeke rast têkûz û mayînde zehmete ku pêk bê. Ango, wê dîroka me kurdan her dîroka li dijî dewletê û têkçûna bi îxanetê be. Bi kurtasî ne neyarên Kurdan wekî dagirkerên welatên din in, ne jî Kurd dişibihin gelên din. Bi Rêber APO û PKK ê re gaveke mezin ber bi welatparêzîyeke rast ve hate avêtin. Lê li gorî cangoriyên ku heta îro hatine dayîn û êşa ku beşeke mezin ji civakê kişandî, welatparêziya birêxistinkirî pir û pir lewaze, li şûne! Welatparêziyeke nerêxistinkirî tiştekî nayê! di rêxistinkirinê de hêza civakî derdikeve holê û ew dibe hêza serkeftina misoger.Herwiha ji bûyî serkeftineke misoger pêdiviya me Kurdan bi axlaqekî civakî heye. Axlaqê civakî mîna ku Rêber APO dibêje;

"Mirov dikare exlaq ji bo civakê weke hafîza polîtîk jî qebûl bike. Civakên ji exlaq bûne yan jî ji exlaq mehrûm bûne hafîza xwe ya polîtîk ji dest dane, ango hêza wan a pîvan û saziyên ji rê û resmê xelasbûye, ji dest dane. Ev jî tê wê weteyê ku civak ji xwe mehrûm maye, li her cure kirînên ji hundir û derve yên asîmîlasyonîst, mêtînkar û arastinê zordestiyê hatiye vekirin."

Em wekî gel di pêvajoya di qirkirinê re têne derbas kirin. Ji lewran em ê rêxistina xwe ya civakî xurt bikin û tev bi hev re serkeftî bin, an jî em ê werin tune kirin. Wekî gel biryara me ye! Du rê li pêşiya me hene; an serkeftin an jî wekî gel tunebûn!






# 'Bêdengiya navneteweyî hevkariya bi sûcên dijmirovî re ye'

**Endamê Desteya Rêveber ya MSD'ê Ezher Ehmed diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên niha dewamiya êrîşên qirkirinê ye ku bi 10'ê salan dagirkerî dide meşandin û got, gelên Rojava di ber tevahiya mirovahiyê de şerê çeteyên DAIŞ'ê kir û berdêlên giran dan, divê cîhan jî bi erkê xwe yê exlaqî rabe û çavê xwe ji êrîşên dagirkeriya Tirk negre.**

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker ji despêka şoreşa 19'ê Tîrmehê ve, dest bi êrîş û planên qirêj yên li dijî gelên Rojava kir. Dagirkeriyê bi riya komên çete yên wekî Cebhet Alnusra û çeteyên DAIŞ'ê êrîşên berfreh li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk anîn. Lê piştî têkçûna hewldanên dagirkeriya û pêşketina pergala Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, dewleta Tirk a dagirker bi riya artêş û çeteyên xwe êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kir.

Herî dawiyê di 4'ê Cotmeha 2023'an, dagirkeriya Tirk bi dijwarî êrîşî heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir, di encamê de 2 jê zarok 48 kesan jiyana xwe ji dest dan. Her wiha dewleta Tirk a dagirker binesaziyên heremê kir armanc û di encamê de 17'e jêderên petrolê, 11 stasyonên enerjiyê, 2 navendên tendirustiyê, navendeke nan, 48 dibistan û zêdeyî deh navendên pîşesaziyê hatin hedefgirtin.

Derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên ser herêmên bakur û rojhilatê û bêdengiya navneteweyî ya li hemberî êrişan, endamê Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehmed ji rojnameya me re axivî.

Ezher Ehmed diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk yên 4'ê cotmehê yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, berdewamiya êrîşên qirkirinê yê ku bi 100'ê salan li dijî gelê kurd tê meşandin û wiha domand: "Êrîşên li ser Rojava , Başûr, Şengal, Mexmûr û Qadên Berxwedanê Yên Gerîlayên Azadiyê tev bi yek armancê pêk tên, ew jî qirkirina gelê Kurd e. Zêdebûna êrîşan di vê demê de ne tesadife, bi salvegera Komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê ev êrîş pêk ahtin, dagirkeriya Tirk xwest bi van êrîşan vîna gelê kurd yê ku li ser ramanên Rêber Apo têkoşînê dike, bişkîne."

**'Hêzên desthilatdar ji projeyên demokratîk ditirsin'**

Ehmed bakişand ser tirsa dewleta Tirk a dagirker ji projeya Neteweya Demokratîk û wiha got:"Ji ber ku dewleta Tirk a dagirker ji projeya Rêveberiya Xweser ya ku Netewya Demokratîk asas digr ditirs e, êrêşên xwe yên li dijî gelên herêmê pêk tîn e. Dewleta Tirk dema ku dibîne li bakur û rojhilatê Sûriyê rêveberiyek demokrat heye, sazî xwe bi rêxistin dikin, karê xizmetguzariya bi rêk û pêk tê meşandin û hêzek leşkerî ya parastina gelên herêmên dike heye, ew zêdetir hêrs dibe û êrîşên hovane yên li dijî herêmê zêdetir dike. Herwiha tirsa dagirkeriya Tirk ya herî zêde ji belavbûna fikrê Rêber Apo ye. Her pêşketinek li cem gelê kurd tirsekê di dilê dagirkeriya Tirk de çêdike."

**'Hikumeta Şamê bi bêdengiya xwe dibe hevkarê dagirkeran'**

Ehmed da zanîn ku hêzên navneteweyî ji ber berjewndiyên xwe çavên xwe ji êrîşên dagirkeriyê digrin û wiha pê de çû: "Herdem di civînên Astanayê de hikumeta Şamê, Îran, Rûsya û dewleta Tirk û çeteyên wê dixwest in Rêveberiya Xweser têk bibn û destkeftiyên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ji holê rakin. Herwiha ev hêzên desthilatdara yên ku li ser axa Sûriyê ne, ji fikrê Neteweya Demokratîk ditirsin û xwestin bi tevahiya rêbazan rê li ber belavbûna fikrê azad bigrin. Hêzên desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe ji pirojeya Xwişk û biratiya gelan bi tirsin. Ji ber ku çiqas demokrasî bi hêz bibe, sîtemên desthilatar lawaz dibin. Hikumeta Şamê jî cihê xwe di nava planên li dijî Rêveberiya Xweser digre, ji ber wê li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagirker bêdenge û tu helwstê nîşan nade. Hikumeta Şamê dixwaze îradeya gelên herêmê bê şikandin û destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê têk biçin, dixwaze rewş vegere wekî beriya 2011'an, da ku desthilatdariya xwe li ser tevahiya Sûriyê ferz bike. Ji ber wê jî demokrasî û projeya Neteweya Demokratîk ne li gorî berjewendiyên hikumeta Şamê ne. Tevî ku armancgirtina binesaziya herêmê sûcekî dijmirovî ye, lê her kes û di nav de hikumeta Şamê jî, bêdengin."

**'Divê demokratên cîhanê bi erkê xwe yê exlaqî rabin'**

Endamê Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehmed bang li azadxwazên cîhanê kir ku li hemberî sûcên dewleta Tirk bêdeng nemînin û axaftina xwe wiha bidawî kir: "Di dema niha de, bi van êrîşên qirkirinê yên ku dagirkeriya Tirk li dijî gelê Kurd dide meşendin, tevahiya cîhan bêdenge, dagirkeriya Tirk tevahiya pêwistiyên jiyanê yên gelên herêmê dike armanc. Her kesê ku bi dagirkeriya Tirk re di nava peymanan de û li hemberî sûcên dagirkeriyê xwe bêdeng dike, hevkarê sûcên dijmrovî yê dagirkeriya Tirk e. Em bang eniya demokratîk li cîhan, kesên hiqûnas, siyastmedar, rewşenbîr û çalakvan dikin ku li wijdanê xwe vegerin û li hemberî êrîşên dagirkeriya yên li ser herêmê bêdeng nemînin. Gelê Rojava di ber tevahiya cîhanê de şerê çeteyên DAIŞ'ê kir û bi hezara şehîd danîn, ji bo parastina nirxên exlaqî yê mirovahiyê berdêlên giran dan, lê li hemberî êrîşên qirkirinê yên li ser Rojava tevahiya cîhan bêdenge. Divê cîhan li wijdanê xwe binêre û lêborîna xwe ji gelê Rojava bixwaze."



# 'Çareseriya pirsgirêkên herêmê, Pirojeya Rêveberiya Xweser e'

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Desteya Têkiliyên Derve a Rêveberiya Xweser bi awayekî domdar Şandeyên derve pêşwazî dike û li gelek paytextên cîhanî hevdîtinan pêk tîne. Endama desteyê Gulistan Elî diyar kir ku naveroka hevdîtinên wan danasîna projeya Rêveberiya Xweser, sûcên dagirkeriya Tirk û pirsgirêka çete û malbatên DAIŞ'î ne.**

Ji destpêka damezrandina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û heta niha, ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, ew hewldana pêkanîna diyaloga Sûrî-Sûrî dike, herwiha li ser asta cîhanê gelek danûstendin û civîn pêk anîn e. Rêveberiya Xweser ku tevahiya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê di nava xwe de dihewîne, gelek gavên girîng avêtin, di 18'ê Nîsanê 2023'an de jî, rêveberiyê Benameyeke ku ji 9 xalan pêk tê, ragehand, li gorî siyastmedar û lêkolînerên siyasî ev beyanname ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê çareseriye. Ji bo danasîna Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, Desteya Têkiliyên Derve a Rêveberiya Xweser bi awayekî domdar Şandeyên derve pêşwazî dike û li gelek paytextên cîhanê têkiliyan ava dike.

Derbarê kar û xebatên Desteya Têkiliyên Derve endama Desteya Rêveber a Desteya Têkiliyên Derve ya bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulistan Elî ji rojnameya me re axivî.

Gulistan Elî diyar kir ku ji Desteya Têkiliyên Derve û şandeyên Rêveberiya Xweser tevgereke berbiçav pêk tînin û wiha got: "Bi armanca danasîna şoreşa Rojava, projeya Rêveberiya Xweser, teşhîrkirina sûcên dagirkeriya Tirk û bandora êrîşên wê, çaresrkirina pirsgirêka çete û malbatên DAIŞ'ê yên li cem Rêveberiya Xweser, herwiha ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, şandeyên Rêveberiya Xweser ji bo gelek welatên derve danûstendinana pêk tînin. Wekî her kes dizane çareserkirina pirsgirêkên li bakur û rojhilatê Sûriyê pirojeya Rêveberiya Xweser e, ji bo wê divê naverok, armanc û danasîna Rêveberiya Xweser ji şandeyên derve re bê şîrovekirin."

**'Armanca dagirkeriya Tirk, dagirkirina tevahî axa Sûriyê ye'**

Gulîstan Elî di berdewaymiya axaftina xwe de wiha got: "Dema ku her tişt li Sûriyê hat hilweşandin, êrîş gihaşt astê herî bilind û hikumeta Şamê xwe paş de kişand, di wê demê de gelên Rojava biryar girtin ku bi xwe parastin û rêvebirina xwe bikin, ji aliyê gel ve pirojeya Netewa Demokratîk hat pijirandin. Ji xwe çeteyên DAIŞ`ê ku ji aliyê dewleta Tirk ve dihatin destekdayîn, armanca wan jî ku herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ber bi qirkirinê ve bibin û pirojeya Rêveberiya Xweser têk bibin, ji bo wê ev rewş jî ji şandeyên derve re tên nîqaşkirin. Siyaseta dewleta tirk ji bo dagirkirina axa Sûriyê giştî ye, ji ber ne tenê hin herêmê bakur û rojhilatê Sûriyê hatine dagirkirin, ji Sûriyayê jî Idlib, Ezaz û Cerabils dagirkiriye, di heman demê de herêmê me jî Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê dagir kiriye."



**'Mayîna çete û malbatên DAIŞ`ê li ser tevahî cîhanê metirsiye'**

Gulîstan Elî diyar kir ku dosiya çeteyên DAIŞ`ê yên li herêmên Rêveberiya Xweser girtî ne, dosiyeke cîhanî y e û wiha got: "Divê helwsteke cîhanî bê eşkerekirin ku dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê wê bi çi rengî be, lê mixabin ji sala 2014`an de û heta roja îro jî dewletên navnetewî ji bo dadgehkirina DAIŞ`ê, tu çareseriyê peyda nakin, tenê vegerandina hin jin û zarokên DAIŞ` ye, ne çareseriye, ji ber ne tenê jin û zarokên DAIŞ`ê li vê derê ne, bi hezaran çeteyên DAIŞ`ê yên ku li ser tevahiya cîhanê xeter in, hene. Mayina çeteyên DAIŞ`ê li herêmê bûmbeyekî demikî ye û di kîjan demê de wê bi teqe em nizanin. Ji xwe girtîgehên ku çeteyên DAIŞ'ê di wan de girtî ne , ne li gorî zindanên navnetewîn e, êdî parastinek heye heta astekê ye, lê heta çiqasî wê ev dirêj bike ne diyare, herwiha em dibînin ku rojane êrîşên dewleta tirk a dagirker li ser herêmê berdewamin û ev êrîş dihêle çeteyên DAIŞ`ê hîn zêdetir xurt bibin û tevger bikin."

**'Divê li hemberî sûcên şer cîhan xwe bêdeng neke."**

Endama Desteya Têkiliyên Derve a Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyê Gulîstan Elî axaftina xwe wiha qedand: " Êrişên dewleta Tirk li ser herêmê me ne bûyerekî nû ye, ji sala 2011`an ve heta roja îro êrîşên wê berdewamin. Bi hemû awayan dewleta dagirker sîyaseta xwe li ser herêmê dide meşandin, êdî niha tiştê ku di xizmeta gel de ye, bi hovane dike hedef, wê xwest ku gelên herêmê û Rêveberiya Xweser tengav bike. Êdî tê xwestin daxwaziyên Rêveberiya Xweser ji aliyê qomîteyên lêkolîner û kesên ku sûcên şer dişopînin, werin herêmê û sûcên dewleta tirk a dagirker li hemberî civak, Saziyên xizmetguzarî ê di xizmeta civakê de kirine li ser bisekinin, bêdeng nemîne û destek ji vî gelî re bê dayin, kesê van sûcan dikin û destê wan tê de heye li hemberî dadgehên navnetewî werin tewanbarkirin û hesabxwestin, li gorî wan sûcan jî bên cezakirin çi dewlet be çi kesayet be ev mafeke. Êdî pêwîste ji bêdengiya sûcên şer re dengek bê kirin."